Ronahî
Şopdara Rastiyê ye
Rojnameya siyasî, civakî û çandî Jimar :1286 2-Tîrmeh-2025 www.ronahi.net/ku/

Navnîşan
www.ronahi.net/ku/ rojnameyaronahi @ronahikurdi55
nameronahi@gmail.com Rojnameya Ronahî +963 984 370 218

# ‘Rewşa madî rê li ber pêşketina wênesaz û wênesaziyê digre’

Hemza Sêvo/ Qamişlo



**Wênesaz û şêwekar Emîn Ebdo anî ziman ku li Rojavayê Kurdistanê wênesazî li pêş ketiye, lê negihaştiye asta wênesaziya cîhanî. Herwiha Ebdo diyar kir ku ji ber rewşa madî ya zor û zehmet wênesaz û asta wênesaziyê pêş nakeve.**

Hunera wênesaziyê yek ji hunerên kevnar e, di dîrokê de hunermendên gelekî navdar ên cîhanî wekî Leonardo da Vinci, Vincent Van Gogh û hwd… guhertoyek girîng li hunera wênesaziy anîn.

Lê ji ber qeydên rêjîma Baas, wênesazên Kurd nikarîbûn berî Şoreşa Rojava êşa civaka xwe vehewînin wêneyên xwe.

Ji ber vê yekê hunereke bi zincîrkirî ma û cihê xwe di nava civakê de negirt. Lê piştî Şoreşa Rojava û di vê dema heyî de gelek derfet li ber wênesazên Kurd çêbû da ku hunera wênesaziya Kurdî li pêş bixin, tevî wiha jî dîsa mijara asta vê hunerê tê nîqaşkirin.

Derbarê asta hunera wênesaziyê li Rojavayê Kurdistanê wênesaz Emîn Ebdo ji rojnameya me re axivî.

**Wênesazî li Rojava pêş ketiye, lê neghaştiye asta hunera cîhanî**

Ebdo da zanîn ku li Rojavayê Kurdistanê wênesazî li pêş ketiye, lê negihaştiye asta wênesaziya cîhanî û wiha got: “Berî sala 2012’an di serdema rêjîma Baas de zext û qeydeke pir mezin li ser gelê Kurd û wênesazên Kurdan hebû. Wênesazên Kurd nikarîbûn êşa miletê xwe vehewînin tabloyan, ji ber vê yekê jî wênesaziya Kurdî li Rojava bêbingeh ma û li pêş neket. Di encamê de gelek wênesazên Kurd ji Rojava derketin û berê xwe dan dewletên Ewropayê. Lê bi destpêkirina Şoreşa Rojava re hunera wênesaziya Kurdî hat vejandin û feresendeke dîrokî ji bo wênesazên Kurdan çêbû. Min û çend hevalên xwe yên wênesaz di destpêka Şoreşa Rojava de me yekem pêşengeha wênesaziyê li dar xist û tê de jî wênesazan bi azadî xeyalên xwe û êşa gelê Kurd teyisansin. Paşê guhertin û pêşketinek di warê wênesaziyê de çêbû, saziyên çandî weke Komîna Wênesaziyê, fakulteya Huenrên Bedew li Zanîngeha Rojava hatin avakirin. Li hêleke din ev çend sal in ku Desteya Çandê ya Herêma Cizîrê pêşangehên şêwekariyê li dar dixe. Wênesaz ji tevahiya Bakur û Rojhilatê Sûriyê tevlî dibin, em bi erênî asta hunerê dinerxînin, lê dîsa jî ne di wê asta tê xwestin de ye, pêwîstiya wêneyên ku tên xêzkirin bi felsefe û hunereke mezin heye. Wênesaziya Kurdî ji ber hin sedeman negihaştiye asta hunerên netewên din.”

**‘Divê saziyên Rêveberiya Xweser destekê bide wênesazan’**

Şêwekar û wênesaz Emîn Ebdo amaje kir ku divê saziyên Rêveberiya Xweser destekê bidin wênesazan li pêş bikeve û wiha axivî: “Hunera wênesaziyê felsefeyeke û divê wênesaz rewşenbîr û behremend bin. Lê gelek wênesaz li vir hene tenê weke sîfet ev hunera wênesaziyê girtine û wêneyan xêz dikin, tişta pêwîst ew e ku rihê akadîmîk û felsefe bi hev re were bikaranîn di nav wênesaziyê de. Bi avabûna fakulteya Hunerên Bedew hîmê wênesaziyê hat danîn, asta hunerê li pêş ket, cara yekem e ku Kurd bi vî rengî kar dikin, projeyeke nû ye û siberoj dê baş be. Hetanî ku huner li pêş bikeve, divê warê akadîmî li pêş bikeve, ev erkê saziyên eleqedar e. Eger pîvanek were danîn, ev pîvan li gorî wênesaziya netewên din be wê ev huner li cem me jî bigihêje asteke bilin, ev yek jî ji saziyên çandî û Rêveberiya Xweser tê xwestin alîkariya wênesazan bi riya destekdayîna madî pêk tê. Wekî em dizanin hunera wênesaziyê xwedî pêdiviyan e, jê re gelek amûrên wekî caw, pênûs, boyax û hwd… pêwîst in. Her tabloyeke ku tê amadekirin gelek pere lê diçin. Di heman demê de rewşa aborî ya zor û zehmet ya wênesazan derfetê nade ku hunera wênesazyê li pêş nakeve. Lewma jî divê aliyên eleqedar ji bo pêşxistina hunera wênesaziyê û wênesazan bi erkê xwe rabin.”

# Keleha Hewlêrê; hunergeha Azadê Tinê



Azad Reşîd Hewêz bi nasnav Azadê Tinê ku bi salane tenê li ber Keleha Hewlêrê karê wênekariyê dike, bedewiya xwezayê ji bo xwe kiriye faktorê esasî ya karê hunerê û ji bo ciwanan jî dibêje girîngî bidin kêrhatiyên xwe û got: “Huner nebe jiyan nabe.”

Huner û karê şêwekarî yê destan yek ji karê herî bedew yê hunerê li cîhanê. Herêma Kurdistanê jî xwedî huner û kêrhatiyên mezinin. Xwezaya bedew ya Kurdistanê jî tim bûye mijar û babetên tabloyên hunermendan. Nimûneya vê şêwekar Azad Reşîde ku bi Azadê Tinê tê nasîn, li ber Kelha Hewlêrê karê şêwekariyê dike.

Şêwekar Azad Reşîd karê wî li ser kaxezê bi rengên reş û spî ye. Azad Reşîd şêwekareke li bajarê Hewlêre û ji sala 1984’an ve vî karî dike. Rojane li derdora Kelha Hewlêrê rûdine, wêneyên welatiyan li ser rûpelên spî xêz dike. Şêwekar Azad Reşîd vê dibêje; “Bedewiya xwezayê wisa li min kiriye ku dest bi karê şêwekariyê bikim. Rojane keç û xortên bajar serdana min dikin, ez jî ji bo wan dibim alîkar ji bo fêrî karê hunerê bibin.”

**Xetên reş û spî**

Debara jiyanê ya Azad Reşîd li ser xêzêkirina wêneyên kesên rojane serdana wî dikine û got: “Ez li aliyek wêneyên kesên daxwaz dikin û li aliyê din jî wêneyên kes û hunermendên diyar xêz dikim. Piranî wêneyên ez xêz dikim reş û spî ne. Rengên din jî bikar tînim, lê zêdetir daxwaz li ser reş û spî ne. Ji bo wê min jî giranî daye bikaranîna rengên reş û spî.”

Şêwekar Azad Reşîd destnîşan dike ku her kesê dest bikar yan hunerek bikin rastî astengiyan tê, lê heta niha rastî astengiyan nehatime di mijara karê xwe de û dîsa kesên alîkarî dikin jî pirin û got: “Dema xetan dikişînim pir kêfxweş dibim. Dikevim cîhaneke xeyalan. Her kesê hunereke bike hemû xem û kulên xwe direvin, ji ber ku bi karê xwe re mijûl dibî, ji nava hizir û ramanên te derdikevin û diçin.”

Herî dawî Şêwekar Azad Reşîd bang li ciwanan dike û dibêje; “Bi hêviya her ciwanek yan her kesek hunerek yan kêrhatiyek heye girîngî bidinê ji bo pêş ve biçe. Her tişt bi hunerê bedewe, eger huner nebe jiyan jî nîne.”

**ROJNEWS**



Bi kamîreya Lîloz Hisên

## FERHENGA BIWÊJAN

**Ji pisîkê re gotin; ji her du zarokên te kîjan baş e, got; new new:**
(Ango ne ew ne ew)
- Her du jî nebaş in; yek ji yê din xirabtir e.

**Ji rûyê wî jehir dibare:**
- Dema yek qenciyê bi yekî bike û bi xirabî lê vegere hingê tê gotin.

**Kesê stiriya biçîne wê stiriya hilîne:**
- Kesê keda wî ji bo tiştên nebaş be wê nebaşiyê bibîne.

**Li şûna ku ronahî bike tarî kir:**
- Li şûna qenciyê xirabî kir.

**Ma çûye li wir sîran biçîne:**
- Ne ji bo qenciyê çûye wir; ji bo xirabiyê çûye wir.

**Ma ji bo çandina sîran çûye wir:**
- Bi heman wateyê.

**Mezin kir bi nanê xwe, kir agir berda canê xwe:**
- Dema yek qenciyê bi yekî bike û bi xirabî lê vegere hingê tê gotin.

**Mifsik dizane di binê qazanê de çi heye:**
- Ez wî pir baş nas dikim; tu were pirsa wî ji min bike.

**Moreke reş li eniya xwe xist:**
- Karekî pir xirab kir.


**Ne pîrê baş kir li ser gûniyê rûnist, ne jî gûniyê baş kir pîrê re çû:**
- Her duyan jî nebaş kir; diviya her du jî wisa nekin.

**Ne şeytan bibîne ne qulhûwelah bixwîne:**
- Tu nebînî baştir e; ne yê dîtinê ye.

**Nikare serê xwe rake:**
- Tiştekî xirab kiriye.

Ji Pirtûka Ferhenga Biwêjan Ya Diyar Bohtî

## Rêber Apo bi derbasbûna Rojava di 1979’an de bingeha şoreşê da avakirin



Rêber Apo bi derbasbûna xwe ji Rojavayê Kurdistanê re di 2'yê Tîrmeha 1979'an de, bingeha şoreşa azadiya gelê Kurd li Rojavayê Kurdistanê da avakirin.**R-3**

## Sûriyê di navbera pençên aloziya şer û sîstematîzekirina Îslama radîkal de




Welatê Sûriyê di rêveçûna 14 salan de nava guherînên ciyosiyasî û demografî re derbas bû, nexasim erdnîgariya wê ya bi ser Deryaya Spî ve û dewlemendiyên wê yên binerd û sererd ji bo dewletên pêre cîran in her tim bûye armanceke destwerdanê...**R-5**

## ‘Ez dixwazim vegerim wekî berê’



Li kêleka êş û azara koçberiyê, para xwe ji nexweşiyeke giran girt. Zarokê bi navê Mihemed Elî Şêxo ku heta deh saliya xwe jî mîna hemû zarokan tev digeriye, lê ji ber nexweşiya pûçbûna masûlkeyan li erdê ma. Mihemed li ser kursiyê xwe li paş pancerê bi hisret li zarokan temaşe dike û tenê dibêje, “Ez dixwazim vegerim wekî berê.”**R-6**

## Helbest kaniyeke tu carî zuha nabe



Helbestvanê Kurd Hozan Hiso ji zaroktiya xwe ve hezkirineke wî ya mezin ji helbestê re hebû. Wî ji 12 salî ya xwe ve dest bi nivîsandina helbestê kiriye. Hozan Hiso diyar kir ku helbest kaniyeke tu carî zuha nabe.**R-7**

Ronahî
Şopdara Rastiyê ye
Rojnameya siyasî, civakî û çandî Jimar : 1286 2-Tîrmeh-2025 www.ronahi.net/ku/ Nirx: 500 L.S

# BI PÊŞENGTIYA JIN; XWEPARASTIN

Li ser bingeha Neteweya Demokratîk û ji bo parastina axa welat, ji destpêka Şoreşa Rojava ve, Hêzên Parastina Cewherî HPC û HPC-Jin hatin avakirin û di parastina civakê de rola pêşengtiyê lîstin. Jina ku pêşengtiya şoreşê kir û hebûna xwe di tevahiya qadan de îsbat kir, di qada parastina cewherî de jî serkeftinên mezin bi dest xist û dikarîbû bi rola xwe ya pêşengtiyê rabe. Berpirsa Hêzên HPC-Jin Zeyneb Efrîn destnîşan kir ku têgihêştina cewherê xweparastinê di nava civakê de, bûye zanebûneke giştî û bi pêşengtiya jinê tê birêvebirin.**R-2**









## Peymana Ibraham, kengî, çima û çawa hat îmzekirin?



Peymana Ibraham an jî ya Ibrahîmî, yek ji girîngtirîn peymanên ku Israîlê ji bo wê tevdigere. Bi rêya wê têkiliyên girêdayî ewlehî, aştî, aborî û hwd… bi dewletên Erebî re îmze dike, da ku hin armancên xwe pêk bîne. Ji sala 2020'an ve heta roja îro 4 dewlet tevlî vê peymanê bûne.**R-4**


Zihniyeta xwe bugherin, hûn ê bikaribin xwe biparêzin — Nehîr Pale R-2


Kurtêlxwerên Şer — Farûk Sakik R-5


T. Barrack dê li Sûriyê çi rolê bilîze? — Zekî Bedran R-5


Agirê pîroz dikuje jî! — Rohat Bulut R-6


Projeyên çandî yên bi bandor hildiweşin… kî berpirsyar e — Kemal Necim R-7

# HPC-Jin: Xweparastina cewherî bûye zanebûneke giştî û bi pêşengtiya jinê birêve diçe

Berpirsa Hêzên HPC-Jin Zeyneb Efrîn destnîşan kir ku têgihêştina cewherê xweparastinê di nava civakê de, bûye zanebûneke giştî û bi pêşengtiya jinê tê birêvekirin û got, "Dema em behsa hêzên cewherî dikin, em behsa civakê dikin, ji lewra parastina cewherî erkekî civakî ye û ji mafê civakê ye ku parastina xwe bike".

**Esma Mistefa/Qamişlo**

Yek ji stûnên bingehîn yên ku di Şoreşa Rojava de bûne bingeh û gihîştiya asta ku em tê de ne; Stratejiya xweparastin û parastina cweherî ye. Bi taybet girêdayî girîngî, rol û xebatê Hêzên Parastina Civakî- Jin li Bakur û Rojhilatê Sûriyê Berpirsê HPC-Jin Zeyneb Efrîn bersiva pirsê Rojnameya me dan û hevpeyvîn wiha bû:

**Jin pêşenga civakê ye dema jin xwe biparêze, civakê jî diparêze. Bi nêrîna we jinê çiqas kariye parastina cewherî di civakê de pêk bîne?**

Ji 2013'an heya niha ji ser %70 jin karîbû zanebûna xweparastinê di nava civakê de ava bike. her wiha gelek mînak û piratîkên bi sala hene ku vê yekê tesbît dikin, him di aliyê siyasî, civakî, rêxistinî û leşkerî de; jina ku cewherê parastina cewherî naskiriye xwe îsbat kir. bi taybet bi van êrişên dawiyê yên ku herêmên Bakur û Rojhilatê Sûriyê hedefgirtine, dijmin di hemû aliyan de herêm, gel, bingeh û binasaziya herêmê bi şer û Şerê Taybet dike hedef. Lê tê de ev yek tekez bû ku çiqas rola parastina cewherî derkeve û bi taybet rola jin tê de.
Bi taybet di aliyê leşkerî a vê pêvajoyê de hat tekezkirin ku YPJ û HPC-Jin pêşengtî kirin û pêş ketine. Di her alî de xwe bi rêxistin kirin ji komînê bigre heyanî eniyên şer li hember hemû êriş û destwerdanan bûn bersiv û seferber bûn. Di heman demê de zanebûn û xweperwerdekirina li ser bingehên parastina cewherî hêşt ku civak bi pilan û êrişên dijmin bandor nebe. Êdî em dikarin bêjin ku zanebûn û têgihêştina cewherê xweparastina cewherî di nava civakê de, bûye zanebûneke giştî û bi pêşengtiya jinê tê birêvebirin. Helbet li hember dijminên me divê em di vê astê de nemînin û nebêjin ku têrker e ji ber di her derfetê de dijmin dixwaze li ser me polîtîkeyên Şerê Taybet bide meşandin. yê ku herî zêde jî pê bandor dibe civak e ji lewra divê em parastina civakê xurt bikin.

**Li hember diyardeyên tundiya li ser jin, şerê taybet û hişmendiya serdest a di civakê de. Xebatên we di çi astê de tên meşandin?**

Belê; Ev diyarde weke siyaseteke zirav ji aliyê hêzên desthilatdar ve di nava civakê û bi taybet li ser jinê tên pêk anîn. Ev hişmendî xwe dispêre bi hezaran salan ku her dixwazin rola jinê di nava civakê de



pûç û bê bandor bihêlin. Ev yek jî helbet girêdayî hişmendî û fikrên ku zilamê serdest xwe li ser avakiriye ye. Tundiya li ser jin heyanî îro jî didome, em bixwazin nexwazin rûxmî hemû pêşveşûn û herikînên ku tên jiyankriin, lê hê jî tundiya li ser jinê nehatiye rawestandin.
Yek ji xebatên me yên bingehîn serwextkirina jinan ji siyasetên ku li ser wan tên meşandin e. her wiha parastina jinê ji Şerê Taybet û hişmendiya ku li ser hemû jinan tê maşandine. Ger em di vê warî de ne serwext bin, wê zû zû jin bikeve bin bandora van hişmendiyan û wê ev yek di nava civakê de biteyse. Em naxwazin ku jina heyî weke jina kevneşop a ku li ser van mijar û diyardeyan ne serwexte. Xebatên ku em di vê alî de didin meşandin bi giranî xebatên perwerdê ne. Bi rêya perwerde, ziyaretkirina jinan û birêxistinkirinê, em hewil didin ku jin nekeve xefka van siyasetan. Di heman demê de ger jin li van aliyan têgihiştî û xwedî zanebûn be, wê demê dikare xwe li hember hemû siyaset û ziraviyên dijmin û kevneşopiyên civakî biparêze.

**Di nava HPC- Jin de, çiqas jin cihên xwe tê de digrin, her wiha di herêmên rizgarkirî bi taybet astengiyên li pêşiya wa çi ne?**

Di aliyê hejmar de, bi hezaran jin û jinên ciwan cihê xwe di nava Hêzên Parastina Civakê de digrin. Ji ber ku dema em behsa hêzên cewherî dikin em behsa civakê dikin, û ji mafê her kesekî ye ku bi erkên xwe yên parastinê rabe. Yanî bi gelemperî hemû civak xwe di nava vê hêzê de dibîne, ji ber armanc avakirina hêza gel a civakê bi xwe ye.
Di herêmên rizgarkirî yên weke Reqa, Tepqa û Dêrezorê bi hezaran jin cihê xwe di nava hêzên parastinê yên jin de digrin. Lê helbet di aliyê astengiyan de gelek zehmetî tên jiyankirin. Ev yek jî ji ber sedema çanda eşîrtî her wiha kevneşopiyên pêkhateyên li wan herêman, ev dibe sedem asta ku tê xwestin jinên ji pêkhateyên din tevlî zanebûna xweparastina cewherî nebin. Lê helbet di aliyê derbaskirina van zehmetiyan de gelek hewildanên me hene û xebatekî berfireh tê meşandin.

## Ji Pênûsa Jin

### Zihniyeta xwe bugherin, hûn ê bikaribin xwe biparêzin

Nehîr Pale

Malbat û civak li ser zîhniyeta ku dixwazin, jinê perwerde û mezin dikin. Çiqasî li gorî wan tevbigere û li ser rêbaz û qanûnên wan bimeşe ew qasî baş e. Ji aliyekî ve civaka zayendperest û ji aliyê dîtir ve dîn rê nîşanê jinê didin û pîvanan jêre datîn in. Ev pîvanên ku ji jinê re diyar dikin navê parastinê lê dikin. Jin hîna temenê wê nebûye 10 salî destpê dike difikire wê çawa namûs û şerefa xwe biparêze û ji bo neçe cehenemê ew ê çi bike. Di şîretên malbatê û pirtûkên pîroz ên dîn de riya xwe dibîne. Dilê wê çi jêre bibêje yan ew çi dixwaze ne girînge, ji bo neçe cehenemê û namûsa xwe biparêze tişta jê tê xwestin ew ê bike. Mirov li vir dikare bibêje ku kengî jinê destpêkir wisa fikirî ew ket xefka sîstema baviksalarî û radestî mêr bû.
Li gorî zagonên dîn û malbat ji jinê re datîne divê her tim nûnerê xwedê yê li erdê wê biparêze, ew jî mêr e. Bi vî awayî li gel dîn şûna jinê mêr pîroz e û divê her tim ew jinê biparêz e. Ev zîhniyet gelekî kûr di mejiyê jinê de hatiye rûniştandin û nefesê lê teng dike. Ji ber mêr çarenûsa jinê diyar dike, şûna wê biryar digre û her tim di bin parastina wî de dimîne, rojane jin dawî li jiyana xwe tîn in. Jin hîs dikin û dibînin ku şaş dijîn, hewl didin xwe ji vê yekê rizgar bikin û dema neghîjin encamê dawî li jiyana xwe tîn in. Jinên ku di bin parastina mêr de ne dawî li jiyana xwe tîn in. Ev tê wateya jin di nava lêgerê de ye ku qebûlnake mêr parastina wê bike. Wê demê wê jin bi kîjan rêbazan parastina xwe bike?
Mîna di mejiyê me de hatiye rûniştandin xweparastin ne tenê di çek bikar anînê de ye, dibe ku zîhniyeta xwe guhertin xweparastina herî mezin a jinê be. Hemû ramanên ku di mejiyê me de hatine ji me têxwestin ku em xwe jê rizgar bikin. Yek ji fikar û ramanên ku em fêrî wê kirine nakeve bin xizmeta me de. Ew gotina ku dibêjin bav, bira, hevjîn û kur yê te biparêze xapandina herî mezin e. Ne bav, ne jî hevjîn, bira û kur jinê diparêz e. Di nava civakê de bi hezaran mînak hene piştî ku keç zewicî êdî dibe mulkê hevjînê xwe û êdî bav berpirsyartiya wê raneke, mêr tûndiyê li hevjîn, keç û xwişkên xwe dike û kur jî dev ji dayîkên xwe berdidin. Ji xwe eger di dîn de nehatibane gotin ku cenet di bin lingê dayîkan de ye wê hemû kuran dayîka xwe avêtibane kolanan.
Xwe parastin dibe ku berî her tiştî di zîhniyet guhertinê de be, êdî jin nema weke berê bifikire. Destpêke xwe ji têkiliyên malbatî û olî biparêze, her çiqasî ji malbatê dûrbikeve ew qasî wê ji xwe re çareseriyê bibîne û berpirsyartiya xwe rabike. Jinên ku hevjînên wan dimrin êdî berpirsyartiya her tiştî radikin û fêrî her tiştî dibin.

# Sosyalîzma demokratîk bi hevjiyana azad gengaz dibe

**Mîdye Miqted**

Ji bo vekolandina sedemên alozî û qeyranên ku niha cîhan tê re derbas dibe,divê em vegerin dîrokê ango em mejiyan analîzkirinê bispêrin kokê. Hem ji bo nirxandinek saxlem hem ji bo riya çareseriyên resteqîn em raxin ber çavan.
5 hezar sal jin di hemû sîstemên kolekirinê re derbas dibin ango 5 hezar sal e ku hişmendiya mêrê serwer xwe li ser parizvana yekem a xwezayê ku ew jî jin e xwe di cîhanê de bi statu kirî, mêr bi hebûna jinê hat dinyayê û dîsa bi saya keda jinê bû serwer û ya herî balkêş ew e ku eger jin nebûya desthiledariya bi hişmendiya mêr jî nedibûya.Çima em nêrînek bi vê awayî didin? Ji ber ku zihniyeta mêr a serwer dema xwest bibe serwer û navaroka jiyana xwe bi serweriyê dadigire destpêkê berê xwe da jinê û serwertiya xwe bi vê awayî da destpêkirin, jinê xist bin denetima xwe,wê fetisand,ji mafê wê yê rewa bê par hêşt û ya herî girîng ku valatî xist navbera jin û jintiya wê, bi vê awayî zihniyetek antî demokratik di wê valatiyê de bi cih kir. Dîsa her çiqas zeman bi pêşket lê dîsa yên bûn kole jin bûn û yên man serwer mêr bûn,mêrê sexte ewbûn yên ku herî zêde karîbûn di desthiledariyê de bibin pispor û mêrên ku xwe ji azadiya ferdî jî hewlnedan ku para xwe bigirin bûn koleyê zilamên dewletê..
Kengî dewlet û şaristaniyên bi fikirek desthiledar û burjûwa hatin ava kirin daketin meydanê? Dema bi rêvebirin ji destê jin hat girtin ,dema ku berhemên jinê destkeftî û keda jinê ji destê wê girtin û ew berhem kirin alavên bazartiyê û pê aboriya antî komînal dan ava kirin bû.Ne tenê ev lê belê dema ku peyva wekhevî û demokratik bûnê bi jinê re dan paşguh kirin.
Niha aloziya ku kî ji kî bêhtir bibe serwer û hegomontiya xwe li ser cîhanê bide ferz kirin hatiye destpêkirin,şerê niha di navbera Israîl û Îranê de tê meşandin jî vê rastiyê eşkere radixe pêşberî dîrokê. Şerê ku niha tê kirin şerê mezin kirina kesayeta mêr li ser hesabê tunekirina cins û kesayeta jinê ye, heya ku ev şer bi vê rê û rêbazê bê dewam kirin wê wekhevî pêk neyê û heya ku jin tê qetilkirin û herî zêde ew dibe qurban êdî wê azadî jî neyê pejirandin.
Jin ferda herî girîng di civakê de ye hebûna wê sîstemek bi rêxistinbûyî ferz dike lê belê her jinek azad dema li kêleka xwe mêrek bi zihniyetek azad bide ava kirin wê demê wê sîstemek hin zêdetir bi rêxistinbûyî were ava kirin.Hewildan bi xwe re encamê tîne ,her me hewilda em sîstema hevseroketî di mejiyê mêr de bidin runiştandin ewqas emê sosyalizma demokrat bidin ava kirin. Ma gelo bê hevjiyana azad sosyalizim tê ava kirin? Jinek azad û mêrek azad nebe wê civakek azad çawa ava bibe? Ma raste em tenê jina ku 5 hezar sal hatiye kolekirin azad bikin û mêrê ku li kêlek jinê bûye koleyê dewletê nedin azad kirin ? Ji xwe nakokî di vir de ye û gurkirina aloziyê di vir deye .Em ne ew zihniyeta ku xwe azad kirin li ser hesabê kolekirina cinsê dinin .Aloziya cîhanê heya ku bê çare kirin hewcedariya xwe bi demokratiyê û sosyalizmê heye ,heya ev yek di mejiyê komikên herî biçûk yên civakê neyên sepandin wê şer neyê seknandin.
Hewcedariya civaka ku ewqas sal di kesayeta jinê de hatiye perçiqandin bi rêvebirinek xwe bi xwe heye ku xwe nespêre zagon û desturên dewletên desthiledar û hegom,meyzandina li morî ku çawa tevdigerin û bi hev re dibin alîkar ji bo debo kirina erzaqên xwe bi serê xwe sîstema xwe bi rêvebirinê radixe ber çava,ji tiştên biçûk fayde û sûd tê wergirtin ji hurgiliyan wane tên rakirin.
Kengî sîstemên hegom tên vala derxistin dema hevjiyana azad tê valaderxistin her wiha li tenişta wê jî dema hevjiyana azad xistin meryetê ewqas dawî li dîktetorî û antîdemokratik bûnê tê û sosaylizim tê ava kirin ji xwe ji xalên herî serek ku sosyalizim bibe sosyalîzim ew e ku hevjiyana azad were geş kirin.



# 'Helbest kaniyeke tu carî zuha nabe'

Helbestvanê Kurd Hozan Hiso ji zaroktiya xwe ve hezkirineke wî ya mezin ji helbestê re hebû. Wî ji 12 salî ya xwe ve dest bi nivîsandina helbestê kiriye. Hozan Hiso diyar kir ku helbest kaniyeke tu carî zuha nabe.

**Dîlan Mulhim\Qamişlo**

Helbestvan ew kesên xwedî hestên mezin in , gotinên wan bi awaz in û ramanên wan kûr in. Lê belê her helbestvanek xwedî rêbaz, jîrbûn û asteke wêjeyî ya cuda ye. Ji van helbestvanan jî helbestvanê Kurd Hozan Hiso ye.

**Kurtejiyana Hozan Hiso**

Ciwanê Kurd Hozan Hiso di sala 1996'an de li gundê Seyranê yê girêdayî bajarê Dirbêsiyê ji dayîk bûye. Herwiha wî zaroktiya xwe li gundê Seyranê jiyan kiriye. Piştire ji ber rewşa xwendinê berê xwe dana bajarê Dirêbêsiyê û niha li wir jiyan dike.
Helbestvanê Kurd Hozan Hiso, di derbarê jiyan û xebatên xwe yên di warê helbestê de ji Rojnameya me re axivî.

**'Hezkirineke min a mezin ji helbestê re heye'**

Hozan Hiso di destpêka axaftina xwe de wiha got:" Ji zaroktiya xwe ve hezkirineke min a mezin ji helbestan re hebû. Dema ku ez heft salî bû, min li helbestên Seydayê Cegerxwîn, Ehmedê Xanî û Melayê



Cezîrî guhdar dikrin. Herwiha piştire dema ku temenê bû 12 salî min dest bi karê gotin û nivîsandina helbestê kir. Di heman demê de min peyv û hevok li cem xwe komdikirin, hebest bi kurdî, lê min bi zimanê erebî dinivîsandin. Di wê demê ez di nava malbatê de hatin naskirin, xalê min ew helbestên ku min dinivîsandin dixwendin. Lewma xalê min gotinek got ez dixwazin ku wê gotinê bînin ziman, got xwarzê xwediyê te nînin, heger xwediyê te hebane tê ne li vir bane."

**'Helbesta min a yekemîn li ser welat bû'**

Hozan Hiso da zanîn dema ku şoreşa Sûriyê destpêkir, di 17 saliya xwe de koçberî Bakurê Kurdistanê bû û wiha pê de çû:" Li Bakurê Kurdistanê di sala 2014'an de, min yekemîn helbest li ser welat nivîsandin. Di heman salê de, ez vegeriyam Rojavayê Kurdistanê û min fakûlteya hiqûq li zanîgeha Hesekê xwedin, lê di wê demê de, sala 2014'an êrişî li ser zanîngehê hatin kirin. Ji ber rewşa şer û aborî min xwendina xwe berdewam nekir. Careka din ji ber rewşa Sûriyê a xirab ez vegeriyam Bakurê Kurdistanê û 12 salan li wir jiyan kir. Piştire min biryar da ku ez vegerim Rojavayê Kurdistanê li welatê xwe. Piştî demekê derfet çêbû ez çûm Başûrê Kurdistanê û li wê derê dostekî min yê nivîskar hebû. Dema ku min helbestên wî xwendin, bû hêzek ku ez nivîsandina helbestê berdewam bikim. Lewma min helbestek dîsa li ser welat, li Başûrê Kurdistanê nivîsandin."

**'Zêdeyî 60 berhemên min yên helbestan hene'**

Hozan Hiso eşker kir ku ew 9 mehan li Başûr jiyan kir, piştire vegeriya Bakurê Kurdistanê û wiha berdewam kir: " Dema ku ez vegeriyam Bakurê Kurdistanê, ew helbesta ku min li Başûr li ser welat nivîsandibû çap kir. Herwiha heta niha zêdeyî 60 berhemên min yên helbestan hene. Di heman demê de, helbestên dirêjî hatin nivîsandin. Ev 60 helbest bi hevokên Kurdî hatine nivîsandin û wê du Pirtûkan dagirin, lewma min du helbest kirine kilîp û belavkirine. Ez amedekariya çapkirina pirtûkekê dikim, ku wê di demekê nêzîk de were çapkirin. Ez helbestan bi rengî nûjen dinivîsin û dibêjim, ji ber ku di vê demê de mirov zêdetir li helbestên nûjen guhdar dikin. Ez hewldidin ku zêdetir gotin û nivîsandina helbestên xwe li pêş bixim. Di heman demê de, helbest ji bo min kaniyeke tu carî zuha nabe."

**'Ez bi hêvî me ku helbestên min bibin riyeke rast li pêşiya nifşê nû'**

Hozan Hiso axaftina xwe wiha bi dawî kir: "Min helbestên xwe bi awayê nûjen, kilasîk, felsefî, evînî û çîrokî nivîsandine, di demeke nêzîk de ez wan helbestan bikim berhem. Ez niha romanekê bi ziman Kurdî û erebî dinivîsim, di heman demê de hazirtiya du helbestan jî dikin. Herwiha ew her du helbestên ku ez hazirtiya wan dikim, li ser evîndarî û şehîdan ne. Ez bi hêvî me ku ev helbestên ez dinivîsim bibin riyek rast li pêşiya nifçên nû. Banga min ew ku çand û huner bi helbestvanan re bibin alîkar, da ku helbestvan karibin berhemên xwe çap bikin."

# Çend gotin li ser wêjeyê (2)

**Cîger Efrîn**

Zimanê wêjeyê; Wêje ji hêlekê ve rasterast ziman e. Hûnandina bûyeran bi zimanekî herikbar e; bi mirov şêrînkirina wî zimanî ye û di nava baskên xwe de mayîndekirina zimanê wê civakê ye. Bi gotineke din wêje; pifkirina rih û zindîhiştina giyana zimanekî civakî ye û xelaskirina wî zimanî ji mirinê ye. Ji lewra dagirker gava welatekî dagir dikin, pêşiya pêşîn dest diavêjin berhemên wê civakê ku wê civakê bê rih bihêle û bi demê re ew ziman biçilmise, hişk bibe û ji ser rûyê erdê rabe. Iskender bi wê armancê xezîneya Med'an Zend Avesta ji Medya bir û Kurdên Med'î bê pirtûk hiştin. Umer Bin Weqas bi heman armancê pirtûkxaneya Amedê şewitand, Holako jî da ser dewsa wî û pirtûkxaneya Kirmanşahê şewitand.

Zimanê wêjeyê hem pir vekirî ye û hem jî sergirtî ye;
a- Ziman vekirî ye; hemû mirovên ku dizanin bi wî zimanî bixwînin peyama ku wêjevan dide fêm dikin.
b- Ziman sergirtî ya; ji bo ku xwîner jê fêm bike divê li ser berhemê biponije û bi xwe bigihîne peyama ku wêjevan dixwaze bide. Heger peyam vekirî were dayîn nabe berhemeke wêjeyî, dibe berhemeke dîrokê, berhemeke siyasî, an jî dibe berhemeke ku mijarên derûniyê vedibêje.
Tê zanîn ku, tîp û kesayet ne heman tiştin û çêkirin-avakirina kesayetekê ji çêkirina tîpekî cuda ye. Kesayet hemû wesfên manewî û derûnî ya kesekî, ango lebat, xûy û tevgerên kesekî/ê di nava jiyana xwe de bi dest xistiye ye. Tîp; kesekî/e balkêş û ji yên derdora wî/wê cuda re tê gotin. Bi gotineke din, tîp; birqandina kes ya derve ye, şeklê kes e, ne cewhera kes e. Ancax kesayet hem şeklê kes e û hem jî cewherê kes e. Ji lewra wêjeya bi tenê bi şeklê kes ve mijûl nabe, şeklekî dide kes, lê peywira bingehîn ya wêje ye avakirina wesfên manewî û derûnî, ango dayîna kes awaya lebat, xûy û tevgerkirina wê/wî armanc dike. Her tişta dervayî civakê rexne dike û tiştên civaka siberojê jî bi awayekî estetîk wekî xisleta mirovê/a mînak raber dike. Vê yekê bi awayê beloq nake. Jixwe gava bi awayekî beloqî hate nivisandin, ango rasterast hate gotin; "ev e, kesê/a civaka nû, kesê/a siberojê", xwîner dide revandin. Di vê wateyê de zimanê wêjeyê sergirtî ye.
c- Lê ev jî heye; peyama ku wêjevan dixwaze bide li tevahiya berhemê belavkiriye. Bi bûyer û kesan tê dayîn. Di vir de bi gelemperî tişta heta niha hatî kirin birqandina xwezayê ya li ser berhemê û derûniya kes e. Mijarên siyasî yên ku têne vegotin jî, bi gelemperî yên têkildarî dewletê û feraseta dewletê ne. Halbûkî diviyabû bi awayekî rewşa exlaqî û polîtîk a kes/civakê bihata verişandin û hêza kes/civakê ya dîtina çareseriyê ji pirsgirêkên xwe re bihata raberkirin. Gava dahûrandina kesayetê were kirin, xwîner ji wê berhemê rewşa exlaqî û polîtîk a kes/civakê fêm dike û dikare bi awayekî nerasterast kesayeta xwe biguherîne.
d- Wêjevan ne desthiatdar e ku rasterast fermanan bide. Ji xwe fermanan bide nabe wêje. Lê mirov dikare bêje ku, wêjevan otorîteyeke civakî ye. Ji ber ku li ser navê civaka exlaqî-polîtîk xeber dide û armanca wî/wê ji nivîsandinê bi zimanekî nerim şerê her tişta xirab dike, dibe hêzeke civakî. Heger li dijî her tişta xirab nekeve şer, nabe otorîteyeke civakî. Di nava civakê de çiqas xirabî hebin, civak çiqas ji hev ketibe jî, giyana civakî wê hêzê dide wêjevan ku li ser navê civakê, civaka nû serwerbe û pêşkêşî civakê bike. Gotineke Rêber APO heye ku dibêje; "felsefa min; tişta heyî xirab e, yê baştir gengaz e." Peywira wêjeya şoreşê di vê gotina Rêber Apo de veşartiye, ango zelal e. Herwiha ew gotina Marks a ji bo Feylesofan gotî; ne tenê şirovekirina dinyayê, ya girîng guhartina dinyayê ye. Ji lewra jî gotinên wan feylesofan ji hêla civakê ve nehatin hembêzkirin, bi tenê di nav elîtekî de hatin gengeşekirin. Wêjevanên ku li gorî dewletê berhem derxistine, mîna wan feylesofên ku Marxks qala wan dike ne. Gava hêza guhartinê di berhemekê de tune be, ew berhem ne ji bo civakê hatiye nivîsandin, ji bo nivîsandinê hatiye nivîsandin. Ew, nêzîkatiya desthilatdaran e ku, wekî pir guhartinan pêk tînin raber dikin, lê di bingehê de tu guhartinekê jî nakin. Bi taybetî jî dagirker li mêtîngehên ku dagirkirine ji bo ku civak nûbûnekê nejî û nebe xwedî hêza têkoşînê, wêjeyeke derewîn pêş dixin. Wêjeya civakî jî heta ji dest wan tê dixwazin ji holê radikin. Ji ber ku mîna Çernîşevskî dibêje; "Miletek bê wêje, kor û nezan e. Bi qasî miletek xwedî wêje be, zana û rewşenbîr e, mirovan hîn û şa dike."
Belê, pir kêm şaxên ramanê hene ku xwedî hêza guhartinê ne. Beşa herî xurt ku xwedî hêza guhartina kesayetê ye, bê guman wêje ye. Bi şertê ku bi zimanekî civakî û mijarên têkildarî civakê-kes be, wêje ji çekan jî bi hêztir e. Çek dikuje û di pêvajoya şoreşan de rê ji zayîn û nûbûnê re vedike, lê naafirîne. Ancax wêje hem tişta berê dikuje, hem rê ji zayîna nû re vedike û hem jî cewherekî bi hebûn û bûyîna siberojê dide qezenckirin.

## Têbînî

### Projeyên çandî yên bi bandor hildiweşin…kî berpirsyar e



Kemal Necim

Hefteya derbasbûyî projeyeke din a wêjeyî û çandî ya girîng piştî pênc salan bi dawî bû û rawestiya. Projeya Pêşbirka Helbesta Kurdî ya Ciwanan beriya pênc salan ji aliyê Hevgirtina Rewşenbîrên Rojavayê Kurdistanê HRRK`ê û bi alîkarî û serperştiya Komeleya Janjê Xelef a xêrxwaziyê li Ingilistanê hatibû destpêkirin. Bê guman projeyeke girîng bû ji bo ciwanan ku karibin behremendiya xwe û afrêneriya xwe pêşkêş bikin.
Di pêvajoya 5 salan de bi sedan ciwan beşdarî pêşbirkê bûn û helbestên xwe pêşkêş kirin.
Di encama pêşbirkan de her sal xwediyên sê helbestên herî baş têne xelatkirin. Xelatên pêşbirkê jî diravî bûn. Armanca pêşbirkê ya sereke ku ciwanên Rojavayê Kurdistanê têvedin qada derbirîn û afrêneriya wêjeyî ya bi zimanê kurdî bû.
HRRK`ê di roja radestkirina xelatên pêşbirka sala 2025`an de, ragihand ku projeya wan a Pêşbirka Helbesta Kurdî ya Ciwanan îsal bi dawî bû.
Em behsa sedemên rawestandina vê projeyê nakin, lê ev ne cara pêşî ye ku li Rojava projeyên rewşenbîrî yên bi bandor ji ber sedemên cuda têne rawestandin. Ji wan sedeman ya sereke piştgiriya diravî ye, ku piranya wan projeyan bi piştgirî û alîkariya hin sazî û dezgeh û rêxistinên derve yan ên hundir têne avakirin. Dema ku ew dezgeh û sazî piştgiriya xwe radiwestînin ew proje jî radiweste û namîne.
Di çend nivîsên berê dema me behsa girîngiya xebat, proje û çalakiyên çandî kiribû, ku lidarxistina proje û çalakiyên çandî ne reftareke bê armanc û tenê ji bo şahînî û kêfê ye, lê belê çalakiya çandî bi armanca pêşxistina çand, perwerde û şahiyê di nav civakê de û ji bo dewlemendkirina jiyana çandî ya takekes û civakê bi giştî têne pêkanîn.
Her wiha ev projeyên çandê dibin alîkar ji bo pêşxistina bîreweiya çandî, pêşxistina fêrbûn û perwerdeyê di warên curbecur ên wekî huner, wêje, dîrok, zanist û teknolojiyê de ku ev tişt hemû karîn û jêhatîbûna kesan zêde bike.
Projeya Pêşbirka Helbesta Kurdî ya Ciwanan jî projeyeke wiha girîng bû ji bo pêşxistin, hezkirin û girêdana bi çand, wêje û zimanê kurdî ve, bi taybet ku nifşê Ciwanan ji her beşên din ên civakê bêhtir dikeve ber pêlên pişaftina çandî û jibîrkirina ziman.
Pirsa ku tê bîra mirovan di vê der barê de ew e, çima ev proje bi alîkarî û piştgiriya dezgeh û saziyên derve têne lidarxistin? Her wiha çima dezgehên rêveberiyê yên pêwendîdar ên mîna desteyên çandê xwedî li van projeyên serkeftî û bi bandor dernakevin?.
Xuyaye ku heta niha jî, saziyên Rêveberiya Xweser ên bi kar û barên çandî ve mijûl dibin, nikarîne bibin xwediyê siyaseteke çandî ya diyar ku li gorî wê siyasetê plan û bernameyên xwe yên çandî birêxistin bikin. Ji bo pêkanîna van xebat û karan pêwîstî bi danîn û destnîşankirina siyaseteke rewşenbîrî ya li gorî rêgez û nirxên civakê heye, li gorî wê siyasetê jî plan û projeyên stratejîk û demdirêj bêne sazkirin.
Girîng e saziyên rêveberiyê yên karûbarên çandî van projeyên ku her sal li ber çavên wan dihatin lidarixistin bîbîne û piştgirya wan bike. Pêwîste li gorî siyasete çandî û rewşenbîrî ya diyar tevbigere û nehêle ku li bin siya wê her sal hin proje û çalakiyên bi bandor hildiweşin û tune dibin.

# ‘Armanca me peydakirina jiyaneke bi rûmet ji zarokên sêwî re’

Rêvebera Sêwîxaneya El-Rehmê Intîsar El-Elî anî ziman ku lênerîn û xwedîderketina li zarokên sêwî armanceke sereke ya xebata Sêwîxaneya El-Rehmê ye û wiha got: “Armanca me xwedîderketin û peydakirina jiyaneke bi rumet ji zarokên sêwî re."

**Hêvî Keleş/ Qamişlo**

Sêwîxaneya El-Rehmê di sala 2021” ê ji bo xwedîderketina li zarokên sêwî li Qamişlo hat vekirin.

Derbarê kar û xebatên Sêwîxaneya El-Rehmê de Rêvebera Sêwîxaneya El-Rehmê Intîsar El-Elî ji Rojnameya me re axivî.



**‘Sêwîxane bi armanca hewandina zarokên sêwî hate vekirin’**

Rêvebera Sêwîxaneya El-Rehmê Intîsar El-Elî destnîşan kir ku wan sêwîxane bi armanca ku zarokên sêwî bihewînin vekir û wiha got: “Çi zarokên ku kesî wan tune be em wan tînin li cem xwe û heta ji me tê em xwedî li wan derdikevin û dibin ji wan re weke malbat. Di destpêka vekirina sêwîxaneyê de, tenê beşek hebû, lê di dawiya sala 2022”an de bûn du beş, yek ji keçan re ye û ya din jî ji lawikan re ye. Pirojeyek di demên pêş de heye em ê pêk bînin ew jî avakrina cihekî nû ye, lê di dema niha de ji ber rewşa em têde ne zehmete em vê pirojeya xwe pêk bînin. Em ji bo zarokan her tiştî pêşkêş dikin û heta ji me tê em tiştên ku bi hewcedarî wan in ji wan re peyda dikin û xwedî li wan derdikevin. Em ji aliyê pêdiviyên dibistanê, çalakî, xwarin yan cil û bergên wan tiştên pêwîst pêşkêş dikin, bi taybet em li ser rewşa wan a pîskolojîk disekinin, heta ji me tê em dihêlin ku bi civakê re têkiliya wan hebe û wekî her zarokî bijîn. Di sêwîxaneyê de 15 karker hene ku her yek ji wan kearekî cuda dike, ew jî mamoste ne, yên xwarinê çêdikin, Şêwermenda Derûnî û karkerên ku li ser aboriyê disekin jî hene û pênc karker hene rûniştevanin li sêwîxaneyê ne. Em heta temenê 18 salan zarokan li cem xwe dihêlin heta ku bikaribin xwedî li xwe derkevin û karibin debara xwe bikin, di her beşeke sêwîxaneyê de 13 zarok hene ji temenê 6 mehan heta 15 salî ne. Hin zarok li vir hene ku malbata wan ji ber rewşa wan û nikarîbûna xwedîkrina zaroka xwe wan li cem me bi cih dikin û hin ji wan piştî demekê zarokên xwe dibin lê em ne bi hesanî zarokên wan li wan vedigerîn ji ber ew zarok em wan fêrî her tiştî dikin û li ser derûniya wan kar dikin, ji bo wê em destpêkê wan dixin bin çavdêrkirinê û li rewşa wan dinerin, piştre em gavan davêjin.”

**‘Em ji zarokan re wekî malbatê ne’**

Intîsar El-Elî di dawiya axaftina xwe de wiha got: “Di sêwîxaneyê de bernameya rojane heye, herwiha em li sêwîxaneyê li ser sîstemekê dimeşin ku seatên razanê, xwendinê, tilvizyonê û xwarinê diyarkirî ne. Herwiha em her demekê çalakiyan ji wan re çêdikin û wan fêrî tiştin nû dikin. Hin zehmetî bi me re derbasdibin ji aliyê rewşa aboriyê ve, ji ber ku ev sêwîxane ne girêdayî tu saziyane, mirovin hene ku alîkariya me dikin lê demin tên em gelekî zehmetiya dikşînin ji aliyê mesrefê, lê belê heta ku ji me tê em zarokan kêmî tiştekî nakin. Em her demekê wan dibin çalakiyan ji ber em dixwazin ku weke zarokan normal bijîn û tiştik ji wan kêm tune e û heta ji me tê em dibin ji wan re weke malbat û hewil didin ku valahiya di jiyana wan tijî bikin û bi neamadebûna malbata xwe hîs nekin. Armanca sereke ji sêwîxaneyê ew e ku piştgiriyê bide sêwiyên ku hewceyê alîkariyê ne da ku ew bikaribin xwe bi xwe xwedî bikin, herwiha piştgiriya pêwîst peyda dike da ku ew bikaribin perwerdehiyê bistînin û di atmosfereke malbatî ya tijî evîn û dilovaniyê de bijîn.”

# ‘Ez dixwazim vegerim wekî berê’

**Dilîn Ehmed/Qamişlo**

**Li kêleka êş û azara koçberiyê, para xwe ji nexweşiyeke giran girt. Zarokê bi navê Mihemed Elî Şêxo ku heta deh saliya xwe jî mîna hemû zarokan tev digeriye, lê ji ber nexweşiya pûçbûna masûlkeyan li erdê ma. Mihemed li ser kursiyê xwe li paş pancerê bi hisret li zarokan temaşe dike û tenê dibêje, “Ez dixwazim vegerim wekî berê.”**

Biştî ketina rejîma Esed ji ber kiryarên komê ku girêdayî desthidara Şamê ya nû, hejmareke mezin ji xelkê Şehbayê koçberî bajarê Qamişlo bûn. Hin li gel dostên xwe bi cih bûn hin di xaniyên bi kirê hin jî dibistan ji xwe re kirin cihê jiyana xwe. Malbate Nîdal Ebdulmenan Şêxo ku ji du kuran û keçeyê pêk tê li dibistana Hisên Ebdullah ya taxa Kornîş bi cih bûne.

Ji bilî koçberiyê nexweşiya zarokê bi navê Mihemed Eli Şêxo ku niha 12 saliyî ye, bûye êşa dayîk û bavê wî. Destpêka jidayîkbûn Mihemed mîna hemû zarokan bû tu pirsgirkên wî yê nexweşiyê nîn bûn. Sal bi sal tevgera Mihemed ya meşê kêm bû carnan jî dikuliye. Herwiha dayîka Mihemed diyar kir ku ji heft saliya wî nîşanê vê nexweşiyê lê hat payîn. Ketina wî ya bê sedem zê bû. Lewra malbata Mihemed berê xwe didin Helebê ji bo dermankirina wî, li wê derê ji malbatê re dibêjin ti pirsgirêk tine ye. Lê her ku sal derbas dibû tevgera Mihemed ya meşê kêm dibû. Beriya du salan Mihemed li erdê ma û nema dikare yêdî mîna ber bimeşe.



**Pêwistî bi alîkariyê heye**

Derbarê mijarê de bavê Mihemed yê bi nave Nîdal Ebdulmenan Şêxo ji rojnameya me re axivî û diyar kir ku, dermanê kurê wî li vêderê peyde nebe, lewra tenê ev nexweşî li welatê derve tên tedawîkirin. Nîdal wiha axaftina xwe berdewam kir: “Em difikirin rewşa wî dê baştir bibe, lê her roj rewşa wî xerabtir dibe. Tenê hêvî me li derve ye, lê derfeta me ya madî tineye ku em kurê xwe derman bikin. Lewra kurê min hê di bîra wî deye dema ku mîna hemû zarokan dimeşiya û bazdida, ev yek jî pir zora me tê.”

**Bi hêviyê bavê xwe û hisrê dayikê xwe dijî**

Nîdal Şêxo diyar kir ku Mihemed nikare hemû xwarinan bixwe, divê ew piranî şîr vexwe. Lê gelek caran derfeta malbatê nîne ku jê re şîr bînin. Heriwha ew nikare seatên dirêj rûniştî bimîne divê her ji çend seatan xwe palde, lê ji ber giranbûna laşê Mihemed dayîka wî nikare her tim pêre bibe alîkar. Lewra Mihemed bi hêviyê bavê xwe û hisrê dayikê xwe dijî.

Nîdal bavê Mihemed wiha axaftina xwe bidawî kir: “Mihemed ne zarokekî xwestkar e. lewra ew dihisire ku bûye barekî giran li ser



milê me. Miheemd bi dilê xwe li pêş penceryê li zarokan temaşe bike. Lê çavên wî dibêje ez dixwazim wekî we ji xwe re bilîzim. Êşa hisreta di çavê kurê me de, dikeve dilê me.ji bo vê banga min ji hemû kesê xêrxwaz ew e ku, alîkariya me bikim ku em kurê xwe Mihemed derxin derve û wî derman bikin.”

**“Ez naxweazim kurê min li ser vî kursiyê mezin bibe”**

Dayîka Mihemed ji ber kezeb şewitiya xwe nikarî behsa kurê xwe bikre, lê di ber hisrê xwe re got, “Ez naxweazim kurê min li ser vî kursiyê mezin bibe, ta ku ji me re nebêje dermanê min hebû û we min tedawî nekir.”

Gelek zarok hene ku nexweşiyê jiyan wan bêbext kirin. Jiyana wan maye mîna xewin û hêviyê. Di dilê wan de hêvî ye di çavên wan de ronahiyek heye. Heke destek mirovahîyê bigihêje destê wan, wê jiyana wan were guhertin û wê xeyalên wan pêk were.

## Xwenasîn



### Agirê pîroz dikuje jî!

Rohat Bulut

Civak di mehên payîz, zivistan û Biharê de ji bo debara xwe çandiniyê dike. Piraniya vê debara salê di mehên havînê de tê rakirin. Mehên havînê gelekî germe, çi pel û çilo, giya û nebat hebin hişk dibin. Ev hişkiya xwezayê û bi taybetî ya çandiniyê her tim wekî deriyekî ji xeteriyan re vekirî ye. Ji bo vê jî pêwîstî pê heye ku mirov gelekî baldar be. Belê ew baldarî ya ku mirov li ser hesas tev bigere ne tenê ji bo şewitîna ziviyekî an jî hilberîna wî ya wê salê ye. Bi çirûskeke biçûk a agir herêmeke berfireh bişewite. Ev jî dibe sedema felaketên mezin. A ku dişewite ne tenê debara malbatekê, gundekî yan jî ya navçe û bajarekî ye. Ev bandorê li gelek kesan dike. Lê ya ku em li ser difikirin dîsa tenê mirov e. Em bi şewata erd û zeviyekî tenê xwe difikirin ku dê debara me bi erdê ve here û bişewite. Lê belê di bingeha xwe de bi milyonan zindîwarên ku em bi çavan dibînin û yên ku em wan nabînin di şewatan de dimirin. Em mirov berpirsên her yek ji wan zindewarî ne.

Dibe ku em mirov dikaribin xwe û malê xwe ji şewat û tofanekê rizgar bikin. Lê bi hezaran cureyên zindîwaran hene ku nikarin xwe ji şewatê rizgar bikin. Nebaldariya me mirovan dibe sedema şewitîn û mirina bi hezaran zindîwarî. Dîsa bi şewata giya, nebat û zad û bi hezaran cureyên zindîwar û ajalan birçî dimînin. Li aliyê din tebeqeya destpêkê ya axê jî ji ber şewatê ew taybetmendiyê xwe yê zindîbûyînê ji dest dide, angu bi awayekî ew jî dimire. Dema mirov tabloyeke wiha anî ber çavên xwe divê tevgerîneke mirov ya gelekî baldarî hebe.

Em her tiştî ji bo xwe dihesibînin û di çarçoveya berjewendiyên xwe de nêzî xwezayê dibin. Lê di bingeha xwe de di xwezayê de em tenê najîn û diheman demê de xweza bi xwe jî zindîye ku pêwîste bi vê ferasetê em nêzîkatiyekê ava bikin. Nêzîkatiya me ya li hemberî xweza û zindîwaran tê wateya nêzîkatiya li hemberî xwe. Ev ne gotineke ji rêzê ye. Divê mirov bi qasî ku tiştên ji bo xwe naxwaze bi heman awayî ji bo kesekî din, civakeke din, rureyekî din wê sewalan û hemû heyînên li gerdûnê nexweze. Ji bo wê jî pêwistiya me bi watedayîn, têgihiştin û empatiyê heye. Pêwîste em di warê empatî dayînê de xwe kûr bikin.

Ji lewre jî mirina heyînekî/ê-Jîndarekî ji bo me mirovan divê ne ji rêzê be ku em dizanibin her heyîn bandora xwe li ya din jî dike. Di wateya têkiliya simbîyotîk pêwîste nêzîkatiye bê avakirin. Çawa em ji xwezayê û hemû heyînên heyî têr dibin, jiyana xwe didomînin, pêwîste em jî ji bo domandina jiyana her heyînî biparêzin û bidin domandin. Ji ber vê yekê bi taybetî jî di mehên havînê de pêwîste em zêdetir baldarbin ku nebin sebeba mirin û tunebûna jîndar û xwezayê. Ji lewre tunebûna her jîndewarî û xwezayê tunebûna me bi xwe ye. Bi vê ve girêdayî tunebûna pêşerojê ye. Tu mafê me tune ye ku em pêşeroja xwe, zarokên xwe û zindîwarekî din ê li xwezayê tune bikin, an jî têxin xeteriyekê.

Divê em bizanibin ku ew agirê ku ji bo mirovan pîroz e, di heman demê de dikare dawî li jiyana mirov, civak, zindîwaran û xwezayê bîne. Lewma jî pêwîste em bi taybetî di van mehên havînê de baldarbin û bizanibin ku agirê pîroz dikuje jî!




# Rêber Apo bi derbasbûna Rojava di 1979’an de bingeha şoreşê da avakirin

Rêber Apo bi derbasbûna xwe ji Rojavayê Kurdistanê re di 2'yê Tîrmeha 1979'an de, bingeha şoreşa azadiya gelê Kurd li Rojavayê Kurdistanê da avakirin.

**Birûc Resûl/Qamişlo**

Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan piştî ku Tevgera Azadiya Kurdistanê damezrand, ji ber zextên dewleta Tirk û daxwaza berfirehkirina xebatan di 2’ê Tîrmeha 1979’an de berê xwe da Rojavayê Kurdistanê û gava xwe ya destpêkê avêt Kobanê. Bi vê gavê re xebatên Rêber Abdullah Ocalan ên di nava gel de mezin bûn, li Sûriyê û Lubanê bi hezaran kes birêxistin kir. Li ser vê bingehê ji tevahî bajarên Kurdan ji bo dîtina Rêber Abdullah Ocalan berê xwe didan Heleb, Şam û Lubnanê.

Rêbertî piştî demekê li Kobanê ma derbasî Lubnanê bû. Dema Rêbertî ji Kobanê veqetiya, xelkê li wir hê nizanîbû bê Rêber Apo ji bo Kurdan tê çi wateyê. Piştî hîcreta Rêber Apo bi 33 salan, 19’ê Tîrmeha 2012’an yên destpêkê bi felsefe û fikrên Rêber Apo çirûska şoreşa Rojava, Bakur û Rojhilatê Sûriyê pêxistin xelkê Kobanê bû. Bi 2’yê Tîrmeha 1979’an re hîmê Şoreşa Rojava hat danîn.



**Derketina Rêber Apo li ser vê xetê watedar û dîrokî ye**

Derketina Rêberê Apo jî tenê wiha sînorek derbaskirin nîne, di bingehê xwe de navê jiyaneke nû, felsefe û ramaneke nû ye, tenê derketina derveyê sînorekî ya ferdekî nîne, ji sîstema heyî derketin û alternatîfeke nû pêş xistine. Gelek mînakên dîrokî yên bi vî rengî di vê erdnîgariyê de hatine jiyîn. Ji ber vê derketina Rêber Apo li ser vê xetê watedar û dîrokî ye. Lewre ev derketin bû bingeha hemû pêşketinên ku heyanî roja me ya îro pêk hatine. Bi vê derketinê PKK’ê hebûna xwe parast, bû cihê perwerde û avakirina mîlîtanên Partiyê. Taybetî li hemberî cuntaya 12’ê Îlona 1980’an de Tevgera Apoyî hebûna xwe parast, bi amadekarî û xwe komkirinê karîbû ji nû ve bi awayekî xurt xwe rêxistin bike û hemleyên şoreşgerî bavêje, di heman demê de pêvajoya rizgarkirina Kurdistanê bide destpêkirin.

**Rojava asta eniya paş a parçeyên din ên Kurdistanê derbas nekir**

Rojava ji aliyê cografîk û nifûs de wek parçeyê biçûk ê Kurdistanê dihat pênasekirin û destgirtin. Li gel vê Rojava jî pir bi xwe bawer nebû û derketineke xurt çênekir. Tevî ku kesayetên navdar, xwedî bandor kedeke berbiçav pêşkêş kiribûn; mîna Osman Sebrî, Nûredîn Zaza, Cegerxwîn û hwd. Lê bandora wan di sînorekî pir teng de ma, negihîşt rêxistineke civakî. Rojava asta eniya paş a parçeyên din ên Kurdistanê derbas nekir.

**Pêvajoya bêbextiyê**

Destpêkirina pêvajoya bêbextiya (komploya) navneteweyî û derketina Rêber Apo ji Sûriyê di 9’ê Cotmeha 1998’an de êdî pêvajoyeke nû destpê kir. Hêzên komploger hedefgirtina Rojava kirin plana xwe ya sereke. Bi taybet piştî dîlgirtina Rêber Apo ya di 15’ê sibata 1999’an de û êrişên li ser gerîla û hedefgirtina navenda hareketê ji milê tasfiyegeran ve Rojava ango qada Rêber Apo para xwe ji van êrişan girt. Hêzên komploger digotin “pêwîste ev qad were tasfiyekirin.” Bi vî rengî dixwestin bandora Rêber Apo li Rojava lewaz bikin. Xwe dispartin du faktoran; yek, ji ber ku Rêber Apo ji Sûriyê derketibû, hêzên dijber xwestin bi destê tesfiyegeran wê valatiyê ji xwe re binirxînin, Rojava têxin dest xwe; ya duyemîn, bi Peymana Edeneyê ya ku di 1998’an de, di navbera Sûriyê û Tirkiyê de hatibû îmzekirin. Li gorî vê li dijî Tevgerê hevkariyek di navbera van dewletan de hat çêkirin. Bi taybetî piştî mirina Hafiz El Esed a di 2000’î de ev gihîşt asta herî jor.

**Li Rojava cara yekem jin tevlî rêxistinê bûn**

Bi damezrandina PYD`ê di sala 2003’an de, bi pêşketina Serhildana 12’ê Adarê ya 2004, derket holê ku asta rêxistinî, hişmendî û çanda berxwedanê ya ku Rêber Apo li Rojava avakiribû ew bingehîne, xurte nayê tunekirin, êdî rastiya ku Rojava qada Rêbertiyê ye, gelê Rojava jî gelê Rêbertiyê ye, xwedî şehîd û mîraseke tekoşînê ye. Di dîroka tevgera siyasî ya Rojava de yekemîn car bû ku jin bi rengekî çalak tevlî rêxistinê bûn, yekemîn car bû ku jin ji mala xwe derdikeve û bi vîna xwe ya azad tevdigere, dixebite, bi nasnameya xwe ya azad xwe îfade dike, bi saya xebatên Rêbertiyê yekemîn car cejna Newrozê bi girseyî û li gorî wateya xwe hat pîrozkirin, her wiha ji bo vala derxistina siyasetên qirkirin û tunekirinê û ji bo pêşxistina hestên netewî, ji bo zindîkirina dîroka resen a Rojava, xebateke berfireh a çand û hunerê hate meşandin, di encamê de bi dehan komên hunerî û yekîtiyên rewşenbîran û nivîskaran hatin damezrandin, şoreşeke hunerî, çandî, zanistî hate pêşxistin.

**Hevgirtina gelan**

Di demekê ku dibin siya pergala dewlet netewê de hestên nijadperestî û netewperestî hatibûn kûrkirin li hemberî wê, Rêber Apo li Sûriyê bingeha hevgirtina gelan saz kir, bi taybetî gelên Kurd, Ereb, Kurd û Suryan. Rêber Apo di nava tevlîhevî, pirsgirêk û nakokiyên Rojhilata Navîn de mîna ku li ser pişta şêr be siyaseteke kûr dida meşandin.

Dema ku pêvajoya Bihara gelan li Rojhilata navîn destpê kir, ji her kesî zêdetir tevgera PKK’ê amade bû, ji pêşwazîkirina vê pêvajoyê re, ji ber ku Rêber Apo wê bi salan projeya çareseriyê amade kiribû, tevî ku li Tûnis, Lîbya, Misir, Yemen rejîmên desthilatdar hilweşiyan lê wan nikarîbûn pergaleke demokratîk ava bikin, ji ber wê yekê heta roja îro hîna li wan welatan pirsgirêkên demokrasyê tên jiyankirin. Her wiha li Sûriyê jî pêvajoyek hat destpêkirin, lê li ti deverên Sûriyê guhertin û pêşketina demokratîk pêk nehat, ji bilî heremên Bakur û Rojhilatê Sûriyê ku bû xwedî rêveberî û pergaleke civakî ya demokratîk. Sedema wê ew e ku li vê qadê civakeke rêxistinkirî, xwedî hişmendiyeke perwerdekirî li ser ramanên Rêber Apo heye, Xebat û keda Rêber Apo bû bingeh ji Şoreşa Rojava re, ger Rêber Apo li Rojava bingeh çênekiriba, xebatên perwerde, akademî û aboriyê nemeşandibe, bê guman wê di pêşxistina şoreşê de zehmetî bihatana jiyankirin. Jiyana komûnal, aboriyeke li ser hîmê koperatîfê û pergala rêvebirinê ya meclîsê destpêkê dema Rêber Apo li Rojava bû di pratîkê de bingehê wan hatibû danîn. Ji ber vê gel ji pergala xweseriyê ne biyanî bû, zû xwedî lê derket. Paradîgmaya Rêber Apo ya ku xwe dispêre Civaka demokratîk û Azadiya Jinê û hişmendiya Ekolojîk bû felsefeya tekoşînê, li gorî wê şoreş hat pênasekirin, Şoreşa Rojava (Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê) xwe sipart hişmendiya Neteweya demokratîk, Azadiya jinê, hevgirtin û xwişk û biratiya gelan ji bo xwe esas girt, daxwazkirina desthilatdariyê nebû armanc, berovajî wê avakirina pergala civakî ya demokratîk ji xwe re esas girt.

**Li Rojava ruhê berxedanê**

Ruhê berxwedan û serhildanê yê ku Rêber Apo li Rojava çandibû, bû bingeh ji bo pergala parastinê û serkeftinên leşkerî yên ku pêk hatin, Rêber Apo bû çavkaniya hêz û moralê ya bingehîn ji ciwanan re ku bi ruheke fedayî ref bi ref tevlî YPG, YPJ û QSD bibin, bê teredud gelê xwe û herêma xwe biparêzin, ji her alî ve xwedî li şoreşa Rojava derketin û bûn xwedî roleke sereke di parastina Rojava de.

# Peymana Ibraham, kengî, çima û çawa hat îmzekirin?

**Peymana Ibraham an jî ya Ibrahîmî, yek ji girîngtirîn peymanên ku Israîlê ji bo wê tevdigere. Bi rêya wê têkiliyên girêdayî ewlehî, aştî, aborî û hwd... bi dewletên Erebî re îmze dike, da ku hin armancên xwe pêk bîne. Ji sala 2020'an ve heta roja îro 4 dewlet tevlî vê peymanê bûne.**

Rêşo Mihemed/ Qamişlo

**Peymana Ibrahîm?**

Peymana Ibrahîm ya Îsraîlê di bingeha xwe de ji navê Pêxember Ibrahîm hatiye daraştin, Pêxember Ibrahîm jî wekî pêxemberekî hevbeş ji ola Islamî, Yehûdî û Xirstiyanî re ye. Ev peyman di sala 2020'an de ji hêla Israîlê hat destpêkirin, armanca Israîlê jê ew bû ku aştiyê û hevkariyê di navbera Israîl, gel û welatên Rojhilata Navîn de ava bike. Bi taybet ew dewletên Erebî yên ku hîna Israîlê qebûl nekirine. Di sedsala 20'an de têkiliya Israîlê û dewletên Ereban pir lawaz bû, dijminatiyeke mezin di navbera wan de hebû. Nexasim piştî şerê 1948, 1967 û 1973'yan. Tevî ku Peymana Aştiyê ya Misrê di 1979'an de û ya Urdunê di 1994'an de bi Israîl re pêk hatibû, lê piraniya dewletên Erebî lihevkirin û peyman qebûl nedikirin bêyî ku doza Filestîn here serî. Peymana Ibraham jî ji bo Israîlê tê wateya ku çênabe tu dewletên Ereban bi çi rengî dijberiya wê bikin, di serî de ji bo gelê Filestînê.

**Israîl bi kê re peyman da îmzekirin?**

Yekem car Israîl peyman bi dewleta Îmarat re di Tebaxa sala 2020'an de îmze kir, di wê demê de gelek welatên Erebî ev peyman red kirin, pê re jî dewleta Îmarat ji aliyê civaka Erebî ve hate reşkirin. Paşê di Îlûna heman salê de Israîlê peyman bi Behrên re çêkir. Asta îmzekirina peymanê bi hewldanên Israîlê bilindtir bû, ji ber vê yekê jî Peymana Ibraham bi Sûdanê re hate îmzekirin. Piştî wê di Berfanbara 2020'an de heman peyman bi Mexribê re hat çêkirin. Piştî van peymanên di bin navê Peymana Ibraham de Israîlê bi rengekî fermî ji sala 2021'yan û bi şûn de balyozxaneyên xwe li Îmarat, Behrên û Mexribê vekir, herwiha têkiliyên geştiyarî û abûrî, hem jî peymanên ewlehî, leşkerî û teknolojî di navbera Israîlê û her sê dewletên Erebî de hatin îmzekirin.

**Armanc ji Peymana Ibraham çi bû?**

Wekî tê dîtin armanc ji Peymana Ibraham pêkanîna aştiyê û ewlehiyê di navbera Israîl û hemû welatên Ereban de ye, hem jî welatên ku piştgiriyê didin gelê Filestînî. Bi hinceta pêkanîna aştiyê Israîl bi dewletên taybet re, dixwaze wan pûç û bêbandor bike, ji wan dewletan jî Îran. Di heman demê de Israîl bi hêzdarî li gorî berjewendiyên xwe di herêmê de tevbigere. Armanca veşartî ya vê peymanê rûxandina hemû hêzên ku li dijî Israîlê rabe û guhertina sîstemên dewletên Rojhilata Navîn li gorî berjewendiyên xwe. Li aliyekî din jî pêkanîna projeyên aboriyê li gel welatên derdorê û tevahiya cîhanê, ji wan projeyan, xeta aborî ya ku amadekarî jê re tên kirin a bi navê 'IMEC'ê ye û hwd...



**Dê Israîlê peymanan bi kê re jî çê bike**

Ji sala 2020'an ve heta roja îro Israîl tu peymanên din ên bi navê Ibraham bi dewletên Erebî re îmze nekiriye, lê hertim di hewlanan de bû ku ev peyman pêk werin. Mînak dixwest peymanê bi Lubnan, Sûriyê, Erebistanê re pêk bîne, herî zêde Siûdiyê ango Erebistan gelek caran têklî bi Israîlê di warê hin mijaran de çêdikirin. Piştî bêbandorkirina hêza Îranê li Sûriyê û Lubnanê bi riya şerê ku xwîna sivîlên bêguneh hat rijandin, êdî Israîl xwest têkliyan bi Colanî re çêke û li ser bingeha van têkliyan Peymana Ibraham bi hukumeta Veguhêz a Şamê re îmze bike. Ji ber vê yekê Tirump hat Erebistanê û Colanî hat vexwendin ji bo hevdîtinê, di wê hevdîtinê de yek ji şert û mercên berdewamkirina desthilatdariya hikumeta Veguhêz ew bû ku Colanî Peymana Ibraham bi Israîlê re îmze bike. Lê armanca Israîlê ya bingehîn kişandina Îranê ber bi Piymana Ibrahamê ve ye tevî ku êrişî wê kir, Amerîka destwerdan kir, bi sedan mûşek û diron, herwiha bi dehan balafir ketin xizmeta şerê dualî de. Di sînariyoke ne zelal de ev şer bi agirbestekê de hate rawestandin jî, niha jî Israîl û Amerîka li benda Îranê ne ku peyman û lihevkirinek ji bo çekê nukelerî îmze bike.

# 'Dewleta Tirk dixwaze îradeya gelê Efrînê bişkîne'

Roheyv Keleş/ Qamişlo

**Koçberên kantona Efrînê diyar kirin ku heta niha binpêkirinên çeteyan li dijî gelê Efrînê bênavber dewam dikin û gotin: "Dewleta Tirk û çeteyên wê dixwazin bi rêya binpêkirinan îradeya gelê Efrîn bişkînin."**

Piştî dagirkirina herêma Efrînê di 2018'an de hovîtiya dagirkeriya dewleta Tirk û çeteyên wê li ser gelê Efrînê tu carî nehat rewastandin. Ev 8 salin bê navber sûcên li dijî gelê Kurd li Efrînê dewam dikin. Derbarê binpêkirinên çeteyên dewleta Tirk li dijî gelê Efrînê, koçberê Efrênê yên bi navê Rewşen Mihemed û Hecî Reşîd ji Rojnameya me re axivîn.






Rewşen Mihemed

**'Sûcên li dijî gelê Efînê berdewamin'**

Rewşen Mihemed bal kişand ser binpêkirinên ku li dijî gelê Efrînê tên kirin û wiha got: "Weke em dibînin li Efrînê êriş berdewamin û her demekê mirovek tê kuştin bêyî ku sedema kuştina vî mirovî xuya be û bêyî ku kesek karibe mudaxeleyê bike da ku van binpêkirina bisekinînin, gelê ku vegeriyane Efrînê di tirsekê de jiyan dike, her roj li wir hinek tê kuştin yan tên windakirin. Xwesteka me ew e ku dewletên ku karibin van binpêkirina bisekinînin mûdaxele bikin û kuştina gelê me li Efrînê rawestînin. Herwiha daxwaza me ya sereke ku em jî vegerin bajrê xwe Efrîn û li wir bi aramî jiyan bikin, ji ber ku aramî tune be jiyan wê tune be û tu bi tirs nikare jiyana xwe berdewam bike."



Hecî Reşîd

**'Dewleta Tirk ji her milî ve hewil dide vîna gel têk bibe'**

Welatiyê bi navê Hecî Reşîd destnîşan kir ku ew dixwazin ku di demeke nêz de vegerin bajarê xwe Efrîn û wiha got: "Binpêkirinên li ser gelê Efrînê tên kirin bi awayekî hovane ne. Ji ber binpêkirinên ku li Efrînê tên kirin û êrişîn dewleta Tirk em nikarin vegerin bajarê xwe, ji ber tirsa me li ser jiyana me heye û li ser malbata me ku em dibînin li Efrînê çawa mirov tên kuştin bê sûc û çawa kes nikare van binpêkirinan bisekinîne. Em bi rojan dihejmêrin ta ku em ji vê rewşê derkevin. Dewleta Tirk ji her milî ve daxwaza têkbirina îradeya gel dikin, lê gelê me îradeya wan ji her tiştî xurtire, em dibînin ku çawa li ber xwe didin û berxwedaniyekê bê hempa dimeşînin. Em ê bi giyan, can û zarokên xwe li hember êrîşên dagirkeriya Tirk û komên çeteyên girêdayî wê bisekinin û planên wan vala derxin."



# Sûriyê di navbera pençên aloziya şer û sîstematîzekirina Îslama radîkal de

Ehmed Hesen




Welatê Sûrîyê di rêveçûna 14 salan de nava guherînên ciyosiyasî û demografî re derbas bû, nexasim erdnîgariya wê ya bi ser Deryaya Spî ve û dewlemendiyên wê yên binerd û sererd ji bo dewletên pêre cîran in her tim bûye armanceke destwerdanê, li aliyê din li Rojhilata Navîn di bin navê "Bihara Ereban" de gelek serhildanan ji salên derdorî 2010'an û heya pêvajoya roja îro rûdan û ji guhertina şeklî ya sîstem û serokên wê wêdetir tu pêvajoyeke nû destpê nekir, berovajî wê destwerdanên mezin li wan serhildanan hatin kirin û ew serhildan ji cewherê xwe dûr ketin û ji bo pêkanîna xeyalên hêzên împeryalîst, di serî de Îsraîl û Îngilistanê bûn amûrên mezinkirina fînansê û gurkirina kirîzên herêmî û civakî, Sûriye jî di nav de gelê wê bi piştigiriya hinek hêzên dîtir li dijî zilma rêjîma Baasê serî hildan û xwepêşandan û serhildan pêk anîn, ev serhildana ku bi armanca hilweşandina rêjîma Baasê rabibû bi destwerdana dewleta Tirk, Îran û Emerîkayê ji rêûresma xwe ya bingehîn derket û serî li rê û rêbazên terorane yên komên çekdar da, ev serhildan weke yên beriya xwe serî li siyaseta demokrasî neda û bê piroje destpê kir, di serî de Cebhet El Nusra, DAIŞ, û heya pêvajoya derketina Colanî tiştek bi navê daxwazên "azadî, yekîtî û guherîna sîstema dewletê" nema, di heman çarçoveyê de di nava rêjîma El Esed de jî bi dehan komên çekdar ên girêdayî Huzbullah û Îranê derketin û ji bo firotina çekên Îranê û mezinkirina Huzbullah di Sûriye de xizmeteke mezin kirin, vê rewşa kawotîk aboriya herêmê têk bir, binesaziya Sûriye da ber hilweşandineke mezin, bi hezaran kes dan kuştin, bi sed hezaran dan koçberkirin û zemîna mêtîngeriyê li ber Îsraîlê hêsan kir, di nav de jî şêfê faşîzmê Erdoxan û hikûmeta wî ji bo dagirkirina herêmên Sûrî û şerkirina li dijî statuya Bakur û Rojhilatê Sûriye ketin nava tevgerê û di encama şikestinên ku sîstemê jiyan dikir û valahiya ku herêm di nav de bû, Efrîn, Serêkaniyê û Girê Spî dagir kir, ev gav nexasim piştî têkçûyîna xîlafeta DAÎŞ'ê li ser destên Hêzên Sûriye Demokratîk, Yekîneyên Parastina Jin û Yekîneyên Parastina Gel li Kobanê, Minbicê, Dêre Zorê, Reqa û Baxozê ji aliyê dewleta Tirk ve hat avêtin da ku hinekî rih bide DAIŞ'ê û wê zindî bike, lê ev xeyalên wî li badil hewa çûn û DAÎŞ şikest û bejahiyeke mezin ji xaka Sûriyê hat rizgarkirin û pirojeya Rêveberiya Xweseriya Demokratîk firehtir bû û ji aliyê gelên herêmê ve bi hezkirineke mezin hate hembêzkirin û qebûlkirin. Rêjîma Şamê bi temenê xwe yê dawî lê hatibû li gorî ecindeyên Rosya û Îranê weke koleyekî rahîbên Sumeran diperpitî û dawiya xwe jiyan dikir, lê êdî dem hatibû ku dawiya wê bê anîn û hebûna Rosya û Îranê li Rojhilata Navîn were bêbandorkirin, her kesî jî dizanîbû ku alternatîfa rêjîma Şamê ji bilî pirojeya Neteweya Demokratîk û Rêveberiyên Xweseriya Demokratîk rê nîn in ku pê parastina hemû pêkhateyên heyî were kirin, ji ber ku ev pêvajo bi ser neket niha Sûriye kete pêvajoya kawosa piştî kawosê, ango sîstema nû ya bi serpereştjya Ehmed El Şeri bi vê forma xwe ya şikilgirtî wê rewşê vegerîne xala sifirê û kirîzên netewî kûrtir bike. Sûriye nema dikare li gorî sîstema dewleta netewe şekilgirtinê tehemul bike û pêwîstî bi çêkirina meclîsên demokratîk ên ku ji hemû pêkhate û neteweyan pêk tê heye, ev meclîs dikarin di bin sîwana Rêveberiyên Xweser de xwe sîstematîze bikin û têde mafên hiqûqî, ziman, çand, etnîk û siyasî yên pêkhateyan parastî be, ne wisa be wê her tim kirîz di şêwazên xwe de dubarekirinê jiyan bikin û wê Sûriye ji pêkhateyên Elewî, Durzî û di nav de kurd jî veguhere qada tesfiyekariyê, ya ku niha li deverên Sûriye diqewime vê rastiyê piştrast dike, destpêkê Elewî rastî qirkirineke mezin hatin, di pey re jî pêkhateyên durzî û niha jî li dijî kinîşteyên xiristiyaniyan teqîn û komkujî çêdibin, ev di rastiyê de pilaneke sîstematîk a dewleta Tirk e ku bi destê komên çekdar ên hikûmeta Şamê pêk tê, hikûmet xwediyê berpirsiyariya mezin a van cînayetan e, ji ber ku bêdengiya heyî erêkirina wê ya rasterast ji pêkanîna qirkirina etnîkî ya xirsityanî, elewî û durziyan re tekûz dike.

## T. Barrack dê li Sûriyê çi rolê bilîze?



Zekî Bedran

Nûçeya ku nûnerê taybet ê DYA yê li Sûriyê, Thomas Barrack, dê bi rêveberiya QSD'ê re bicive û peywendiyên bi Şamê re nîqaş bike, di çapemeniyê de cih girt. Rêveberiya Trump dixwaze bi awayekî Sûriyê serwer bibe. Ahmet Şara jî ji vê yekê ne aciz e. Hevdîtina Şara bi Trump re nayê wateyêkê din. Encama dawî tevlîbûna Sûriyeyê bi Peymana Îbrahîmî re ye. Ji bo wan, hêz berî ol û ramanan tê. Ew têra xwe jîrin ku bizanin ku ew ê nikaribin tevî DYA û Îsraîlê di desthilatdariyê de bimînin. Şêwirmend û navbeynkarê wan jî Erdogan e. Erdogan ji hêla hişmendiyê ve ji HTŞ'ê ne cuda ye. Tenê dewleta li herêmê ku di vê wateyê de bi HTŞ'ê re nakokî tine ye Tirkiye ye. HTŞ niha hewl dide ku rêveberiyek navendî û tund ji rejîma Baasê xirabtir ava bike. Cudahiya wê ji Esed ew e ku ew desthilatdariya olî zêdetir dide pêş. Di warê ol û mezhebî de di navbera wî û Erdogan de nakokî tune. Ji bilî demokrasiyê û avakirina desthiladariyeke pir navendî tiştek e ku daxwaza Erdogan ya sereke ye. Sûriyekî demokratîk ne daxwaz û ne jî pêşbirka Erdogan e. Her ku HTŞ'ê hişmendiya xwe ya tûnd li Sûriyê desthilatdariya xwe ava bike û serdest be, ji bo Erdogan ew qas hêsantir dibe ku bi wan re danûstandinê bike.

Erdogan dixwaze bi Trump re lihevkirinekê bike û QSD ji holê rake. Ew israr dike ku QSD tevlî artêşa Sûriyê bib e û were hilweşandin. Li Sûriyê ewlehî nehatiye dabînkirin. Lê ewlehiya herêmên Rêveberiya Xweser û gel ji bo wan tiştekî pênase nak e. Pêşîniya Tirkiyê hilweşandina QSD û bêstatu hiştina Kurdan e. DYA, Sûriye û Tirkiye dixebitin ku kamp û girtîgehên çeteyên DAIŞ'ê, veguhezînin hikûmeta Şamê. Tê zanîn ku ew li ser vê mijarê bi DYA re danûstandinan dikin. Li aliyekî dibêjin bila em li Tirkiyê biratiya Kurd-Tirk ava bikin, li aliyê din jî berdewam dikin ku Kurdan ji holê rabikin. Barack pir baş dizane ku Tirkiye çi dixwaze. HTŞ'ê ji her tiştî re dibêje erê. Lê di pratîkê de ew tiştê ku dizanin dikin. Dema ku ew kesên ku tevlî hêzên leşkerî û ewlehiyê dibin ji bo perwerdeyê digirin, ew li ser dersên şerîet û olî disekinin. Ew dixwazin wan ji hêla bîrdozî ve tevlî bikin û pejirandina wan misoger bikin. DYA û hêzên Ewropî ji vê yekê bêxeber nînin. Destûra demkî ya ku hatiye çêkirin bi tevahî ji bo demokrasiyê girtî ye. Wan heta bertekek cidî jî nedan vê yekê. Barack, ew ewqas li ser daxwaz û pêşniyarên Tirkiyê disekinin ku li hemberî rewşa gelê herêmê bêdeng kor û lal in.

Gelo li Sûriyê şoreş tenê berhema HTŞ'ê ye? QSD'ê li ser 20 hezaran zêdetir şehîd û brîndar dan. Hevpeymana navdewletî û QSD'ê DAIŞ têk bir. Ger DAIŞ nehatiba têkbirin, ger QSD'ê tinebûya, gelo HTŞ niha li Şamê bûya? Ev rastiyên dîrokî wekî ku nîne têne tevgerandin. Wekî din, HTŞ pirsgirêkên ku derdikevin holê bi rêbazên demokratîk çareser nake. Dema ku nakokî bi Elewiyan re hebûn didan xuyakirin û hewildan bi darê zorê çareser bikin û di encamê de, komkujiyek li ser Elewiyan çêbû. Jin û keçên Elewî hatin revandin û wekî xenîmetên şer tên dîtin. Ev nûçeyên ku pir caran di çapemeniyê de tên rojevkirin. Nêzîkatiya wan a li hember Durziyan jî ne cuda ye. Ger hêz û derfet hebûya, ew ê li ser hemûyan dilsozî ferz bikira û yên ku nedipejirandin bi qirkirinê re derbas kiriban. Ev ne tenê pêşbînî an şîrove ne. Ew bi salan e vê dikin, pratîkên wan têne zanîn. Di demên dawî de, li Şamê li dêrekê êrîşeke xwekujî pêk hat. Komkujiyek tevahî pêk hat. Ev çi feraset û hişmendiy e! Mirov çawa tenê ji ber ku ol an baweriyek cuda jiyan dikin, heq dikin ku bimirin? Gelo ew ê bi kuştina wan ol û baweriyên din li ser rûyê erdê ji holê rakin? Ev axên kevnar in. Gelek gel û bawerî bi hezarê salan bi hev re jiyane û bi hev ve girêdayî ne. Gelo pêwîst e ew bên tinekirin û ji van axan bên dûrxistin? Dixwazin van axan ji Mesihî û pêkhateyên xwedî baweriyên cuda tine bikin.

Ew dibêjin ku divê ev kes xwe ewle nebînin û divê koçber bibin. HTŞ xwedî vê ferasetê ye. Guman tê de tine ye. Ger wisa nebûya, dê nêzîkatî û tedbîrên wan ên cidî heban. Divê Barack ji HTŞ'ê, wan nêzîkatî û êrîşên li ser hemû pêkhateyên li Sûriyê û Rêveberiya Xweser bipirsin. Di 10'ê Adarê de peymanek bi HTŞ'ê re hat îmzekirin. Lê HTŞ'ê ji gelên Bakur û Rojhilatê Sûriyê, ku ji aliyê hejmar de rêjeyekê mezin lê dijîn, ti kesî nexist nav nûnertî û endamtiya hikûmeta Sûriyê ya nû. Di nav wezaretan de cih neda wan. Ew naxwazin desthilata xwe bi kesî re parve bikin. Dibe ku Rêveberiya Xweser li ser vê mijarê daxwazek nekiribe, girîngî nedaye van mijaran. Lê mafê wan heye ku beşdarî rêveberiya vî welatî bibin. Wekî din, rejîma yekdest a HTŞ'ê dê li şûna Baasê were danîn. Li gorî vê, hem demokratîkkirina rêveberiyê û hem jî xurtkirina hevpariyê pêwîst e. Pirsgirêk ne tenê tevlîbûna QSD'ê ya artêşê ye. Pêdivî ye ku were pirsîn çima ew pêşî tevlî hikûmet û yekîneyên din ên hikûmetê nabin? Pêwîste vê yekê ferz bikin….

## Kurtêlxwerên Şer



Farûk Sakik

Sed sal derbas bû li ser serhildana Şêx Seîd. Di vî sed salî de dijminê Şêx Seîd ew serhildan li gorî xwe berevajî kirin. Dixwestin aliyê vê serhildanê yê netewî, veşêrin. Bi israr digotin Îngilizan daye destpêkirin. Lê tu carî yek belgeyek jî parve nekirin. Rastiya serhildanê di arşîva wan de, di 'sandoqên divê tucarî neyên vekirin de' rizî bûn.

Bi sal û demê re hin akademîsyen derketin û di arşîvên rojavayiyan de rastî, rastiya vê serhildanê hatin. Di arşîvan de derket holê ku serhildanek ji aliyê Cemiyeta Azadî ve hatî amadekirin û netewî bû ye. Her çiqas Kurdan di arşîvên dewleta Tirkiyê de ev rastî nedîtin, lê di jiyana salan de dîtin ku ji bo Kurdan bi temamî tune bikin, ev serhildan kirine hincet û dest bi zilma xwe kirine.

Bi navê PKK'ê tevgerek derket û xwest ev kes negihîjin hedefa xwe. Ango Kurdan ji ber tunekirinê xilas bikin. Serhildana PKK'ê jî (aliyê eskerî) bi dawî bû. PKK ji bo ku dewleta Tirkiyê wan kiryarên xwe yên piştî serhildana Şêx Seîd dubare neke îro têkoşîneke cuda dimeşîne.

Hemû argumanên ku wê wek hincet nîşan bidin û êrîş bikin ji dest dewletê girtine. Kurdan û PKK'ê bi dewletê dane bawerkirin ku pêşengê wan jî Abdullah Ocalan e. Li ser navê Kurdan ew dikare biryar bide û pêvajoyê bi rê ve bibe. Di dema serhildana 1925'an de kilîka bi dijminatiya Kurdan de bi israr dikirin, serdest bûn. Kurdistan anîn qonaxeke wisa ku zarokên pêşengê Kurdan ji têkoşîna azadiya Kurdistan dûr xistin. Gelek serokeşîr, axa û beg li dora xwe kom kirin. Bi hin berjewendiyên biçûk ew bêdeng kirin. Hemû bûn xwedî mal û milkên mezin. Dewlemend bûn û Kurdistan ji bîr kirin. Abdullah Ocalan van kesan wek 'judenrat' bi nav dike.

Di roja me de jî hin kesên bi vî rêbazî, dixwazin li ser navê Kurdan bi dewletê re kontaktê wan hebe. Êrîşkirina Rêber Apo ji xwe re kirine nexweşî. Ev 'judenratên nû' bi wan kesên di nav dewletê de, di şer de israr dikin re tevdigerin. Heger li vê axê demokrasî pêk were ev herdu 'kurtêlxwerên şer' wê li ortê bimînin. Kurtêlxwerên şer ên di nav dewletê de bi provokasoyanan dixwazin şer nesekine. Kurtêlxwerên şer ên di nav Kurdan de jî bi gotinên derew, dibêjin; Kurdan hîç mafek bi dest nexist û çima PKK dest ji şer berdide.

Rêber Apo û Tevgera Azadiyê bersiv nade van gotinên wan. Ev kurtêlxwerên şer îrojî li her deverî dest bi kampanyayeke reşkirinê ya nû kirine. Em dizanin wê bersiv nedin vê pirsa wan ya 'Karasû' li ku dere. Berê jî çendik û çend caran gotin me Karayilan, Dr. Bahoz û hin fermandarên din kuştiye. PKK bersiv nedida van şerê wan yê derûnî-pîskolojîk. Îrojî wê destûr nede ku ew di bersivan de ji xwe re li hîleyeke din bigerin. Divê kes bi du demogojiyên bi vî rengî nekevin. Bi du encamên pêngava aştî û civaka demokratî bikevin.

Piştî banga Abdullah Ocalan, xeberên şehadetan bi dawî bû. Êrişên li ser Rojavayê Kurdistan sekinîn. Ji ber sedemên siyaseta demokratîk tu kes nehat zindankirin. Siyaseta AKP'ê ya qeyûm sekinî. Di Newroz û rojên taybet de Kurd li qada bûn. Di warê çand, ziman û hunerê de pêşketinên mezin çêbûn. Mîhrîcanên ku motîvên Kurdî têde bûn ji nû de bi rengê xwe hatin lidarxistin. Rêber Apo di pêvajoyên bi vî rengî de gelek caran gavên sembolîk, lê stratejîk avêtine. Ev bi Kurdan daye qezenckirin. Bang gavek bû, kongreya li ser vê bangê gavek bû, dibe ku hin gavên din jî bên avêtin ku piştî wê gava Rêber Apo û tevgera azadiyê, wê li Tirkiyê ji nû de hin gav werin avêtin. Dema ku ev serdema nû bi ser keve, ev 'kurtêlxwerên şer' wê di sergoyê dîrokê de bigevizin.